Têgihîna Namûsê

İsmail Beşikçi
(Wergêr: Roşan Lezgîn).

Li bajarên Kurdan ên mîna Bidlîs, Agirî, Batman, Diyarbekir, Ruha, Wan û Mûşê kuştinên ku wek kuştinên namûsê, wek kuştinên edetan tên binavkirin, çêdibin. Ev kuştinên hanê di encama koçberîyê de êdî li bajarên wekî Stenbol, Adena, Antalya, Mêrsîn, Îzmîr û Sakaryayê jî çêdibin. Li van deveran têgeha namûsê di ser bedena jinê û zayendiyê re tê nasandin. Namûs di ser beden û zayendiya jinê re tê fêmkirin. Di nav malbatê de jinên ciwan yan jî keçên 15-20 salî li gundan yan jî li navçeyan ger bi awayekî nehînî ligel mêrekî di nav peywendiyê de be û ev peywndî ji layê malbatê ve bête bihîstin, hingê malbat vê yekê herwekî "namûsa me herimî, divêt bê paqijkirin…" têdigihê, wisa fêm dike. Dibe ku ev peywendî bi zora mêrî jî çêbûbe. Aşkera bûyîna peywendiyê jî, pirranî bi hemîlebûnê re derdikeve meydanê. Malbat, ji ber ku leke li şerefa malbatê daye, hingê di vî warî de biryara kuştina keçikê didin û vî karî jî yan bi destê birayê piçûk yê jinê/keçikê, ger birayekî wisa nîn be, bi destê birayê mezin yan jî pismamekî wê didin kirin. Mezintirîn tundrevîya li hemberî jinê bi vî awayî tê pêkanîn. Herwisa, ev jî têye zanîn, ew malbatên ku karên wisa dikin, di nav civakê de qedrê wan zêdetir dibe.

Televîzyon, rojname û radyo dema ku nûçeyên bi vî rengî belav dikin bal dikşînin ser meclisa malbatê: "Meclisa malbatê civiya. Bona paqijkirina vê lekeya li ser malbatê û bona parastina şerefa malbatê biryar hatiye dayîn ku ew jin yan jî keça ku di nav peywendiyên nehînî de ye, bête kuştin."

Li gund yan jî li navçeyê ger destê mêrekî li porê keçek yan jî jinekê bikeve, ev yek dibe meseleya namûsê. Bûyereka wisa dikane bibe destpêka şerekî xwînî. Layekî vê diyardeyê ev e. Lêbelê layekî din yê dîyardeyê jî heye, ku tê zanîn, lê behsa wê naye kirin, diveşêrin. Her kes pê dizane lê ji nedîtî ve tê. Di vê gotarê de ez ê hewl bidime xwe da ku piçek bal bikşînim ser vê yekê.

Di herêma Kurdan de ji sala 1984an û vir ve, ev serê 25 salan e şer heye. Hêzên asayîşê hertim li gundan, li navçeyan operasyonan dikin. Carinan, jin û mêr û ciwan û pîr, giş bi hev re bi komelî têne girtin. Kesên ku têne girtin, carinan bi zincîran bi hev ve têne girêdan û wan dibin polîsxane yan jî meqerên leşkerî. Li van deran, hêzên asayîşê, jinên ciwan ji yên pîr cihê dikin û wan li cihekî din girtî dihêlin. Di lêpirsînê de ligel îşkenceyê tecawuz (destdirêjîya namûsa jinê) jî heye. Di vê prosesê de korucî (cehş), endamên JİTEMê, tîmên taybet (quwetî xas), cendirme, polîs û leşker bi darê zorê namûsa jinan diherimînin. Mêrên ku hatine girtin, ango bav û bira û mam û H.W.D. hay ji rewşê hene. Lêbelê li hemberî tiştên bûyî bêdeng in. Ji nedîtî ve tên, her wekî ku tiştek wisa çênebûye. Ew meclisa malbatê ku li gund, li navçeyê ji ber peywendiyeka li derveyî edetan dikane derbareyê jinan de, derbareya keçan de biryara kuştinê bide lêbelê li hemberî wê herimandina namûsê ku li meqera leşkerî ji layê hêzên asayîşê ve çêbûye bêdeng dimîne .**D.R (7)**